HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ

**BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP'Ê**

**ÎLON - COTMEH 2020 / HEJMAR : 09-10**

# KAREKERÊN ÇANDİNİYÊ YÊN BÊNAV:
# KARKERÊN ZAROK

*Karkeriya zarokan di lîreratura navneweteweyî de wiha tê pênasekirin, "ev kar, pirî caran zarokan ji jiyana xwe dûr dixin, potansiyel û rûmedariya wan kêm dikin, zirarê didin gihîştina wan a fizîkî û zihnî."*

*Pêşbaziya hilberîna ji bo bazarê ya bi şoreşa pîşesaziyê dest pê kir û hêrsa hilberîna zêde û qezencê, ji bo hilberînê gera li hêza karkeran a bêewle, bêrêxistin û destheqê kêm pirsgirêkên herî mezin ên serdemê ne û mêtina keda zarokan li wan zêde bûye.*

*Li gorî rapora Rêxistina Xebatê ya Navneteweyî (ILO) ya 2019'an, li dinyayê 73 milyon ji wan di karên xetere de, 153 milyon zarok ên karker tên xebitandin. Herî zêde li sektorên çandinî, xizmet û pîşesaziyê keda zarokan tê mêtin û neheqî li wan tê kirin.*



*Fotoğraf: hayatadestek.org / Kerem Yücel*

***Zarokên ji Rihayê hatine Ordûyê findiqan berhev didik.***



*Li herêma çolwariya Parzemîna Asyayê jinikeke cotkar gava birinc li elegê dixist*

Malbatên li ser zeviyên xwe yan jî yên zeviyên wan tune ne û di şert û mercên nebaş de dijîn; malbatên li bajaran ên bêkar û hejar, ji bo debara xwe bikin û jiyana xwe bidomînin, wek karkerên demsalî diçin deverên derfetên çandiniyê zêde ne. Ev malbat, ji ber karê wan ê bi berdewamî yê dikaribin debara xwe pê bikin tune ye, karên çandiniyê dikin. Malbatên karker ên çandiniya demsalî, ji ber nikarin xwe ji çerxa hejariyê rizgar bikin zarokên xwe jî bi xwe re dibin û wan jî di karên çandiniyê de didin xebitandin. Li gorî daneyên Saziya Îstatîstîkê ya Tirkiyeyê (2019), destheqê karkerên jin ên demsalî 79 lîre, destheqê karkerên mêr 94 lîre ye.




*Fotoğraf: https://tr.euronews.com/2020/08/06/turkiye-nin-gorunmez-iscileri-mevsimlik-tar-m-islerinde-cal-sanlar-n-hayat-mucadelesi*

***Karkera çandiniya demsalî Nilgun Us a ji Rihayê çûye navçeya Kîraz Îzmîrê, diyar kir ku tedbîrên vîrûsa koronayê negirtine û destheqê wan hindik e. Us dibêje: "Sîgortaya me tune ye. Rojê 10 saet bi 80 TLî dixebitin. Serê sibehê di 5:30-6:00'an de şiyar dibin. Xwe amade dikin. Taştêya xwe dixwin. Diçin zeviyê. Saet di 17:00'an de paydos dikin, carna jî 17:30."***

***Us ragihand ku komisyonvanên ji wan re 'dayibaşi' û 'elçi' tê gotin ji wan re kar dibînin û serê her karkerî 10-15 TL ji wan distînin.***

Li dinayayê bi milyonan zarok di karên wisa de dixebitin ku zirarê didin gihîştina wan a fizîkî, zihnî, perwerdeyî, civakî, hestiyarî û çandî. Çi bi hevpeymanên navneteweyî çi jî bi qanûnên welatan wan xebitandina zarokan a di van karan de hatiye qedexekirin. Hevpeymana Temenê Herî Biçûk a bi hejmar 138 ya ÎLO'yê (1973) dibêje ku divê karkeriya zarokan ji holê bê rakirin. Ev hevpeyman, bi Hevpeymana Astenkirina Karên Herî Xirab ên Karkeriya Zarokan hatiye xurtkirin. Ev hevpeyman dibêje ku divê bi lez û bez dawî li karên herî xirab ên karkeriya zarokan bê anîn.



*https://gazete.red/1-milyon-cocuk-tarikatlarin-elinde-2-milyon-cocuk-isci-483-bin-cocuk-evliligi-var/*

***Li Hindistanê zarokên hindî yên li ber Stadyûma Jawaharlalê di projeyeke înşeatê de bi bavên xwe re dixebitin 30.01.2010 ( Daniel Berehulak / Getty Images)***

Li gorî madeya 1'emîn a Hevpeymana Derbarê Mafên Zarokan de ya Neteweyên Yekbûyî ya Tirkiyeyê jî îmze kiriye, her mirov hetanî 18 saliya xwe zarok e. Li gorî "Hevpeymana Çalakiya Bilez a Qedexekirin û Jiholêrakirina Karên Herî Xirab ên Karkeriya Zarokan" îfadeya zarok ji bo hemû kesên temenê wan di bin 18'an de ye.



# Lİ TİRKİYEYÊ MÎNAKA KARKERİYA ZAROKAN A ÇANDİNİYÊ

Dema em bala xwe didin sektora çandiniyê, em dibînin ku ji hêla xwegihandina şert û mercên jiyan û kar, perwerdeyî/tenduristiyê de, zarokên di sektora çandiniyê de dixebitin di nav komên herî bidezavantaj de cih digirin. Xebitandina zarokan a di sektora çandiniyê de yek ji sedemên girîng rewşa malbatan a aborî û civakî ye. Bi taybetî malbatên hejar ên li bajaran, malbatên bêzevî yan jî zeviyê wan hindik, ji bo debara xwe bikin neçar in biçin deverên karê çandiniyê li wan heye.

Li gorî anketa adara 2018'an a TUÎK'ê di çandiniyê de 4 milyon û 983 kes dixebitin û li gorî 2027'an (5 milyon û 36 hezar) kêm bûye. Ji sedî 81,2'yê karkerên çandiniyê bêqeyd dixebitin. Tê gotin ku ji sedî 40'ê îstihdama çandiniyê karkeriya demsalî ya çandiniyê ye. Yanî dikare bê gotin ku li Tirkiyeyê nêzî 2 milyon karkerên demsalî yên çandiniyê hene. Dema koçberiya demsalî malbat ji ber zehmetiyên aborî û civakî zarokên xwe jî bi xwe re dibin.



*Zarokên bûne parçeyekî koçberiya demsalî, ji neçarî dibin parçeyê keda çandiyê. Zarokên karên çandiniyê yên zirarê didin gihîştina wan a beden, zihn û ruhî, ji sedî 50'yê zarokan in ku li Tirkiyê dixebitin.*

“Li Tirkiyeyê hejmara zarokên dixebitin li derdora 850-900 hezarî ye. Nîvê vana 250-300 hezar kes karekerên demsalî ne ku di zeviyên hinekên din de dixebitin; 150 hezar ji wan ji bo alîkariya malbata xwe di zeviyên xwe de dixebitin. Yanî bi giştî 400-500 hezar zarok karên çandiniyê dikin. Hejmareke teqez tune ye. Sedema vê jî tê gotin ku zoriya xebateke berfireh e.”

*Kaynak: http://www.ciftlikdergisi.com.tr/mevsimlik-tarimda-cocuk-isciligi-uzerine/*

# 1- PİRSGİRÊKA GİRANİYA KARKERİYA ÇANDİNİYÊ

Karkerên demsalî li deverên cuda yên Tirkiyeyê karên giran ên wekî çandin û berhevkirina pembo, porteqal, birinc, findiq, silk û karên din ê wiha de dixebitin.

Sedemên ku sektora çandiniyê van karan wekî karên giran dinirxîne ev in:

- ***Bi seatan di bin tavê de dixebitin***
- ***Bi makîne û alavên bêewle van xebatên xwe dikin***
- ***Bi madeyên tehlûke yên kîmyewî rebirû dimînin***
- ***Bê tevdîr û parêzên kesayetî dixebitin û barên giran hildigirin.***
- ***Faktorên derdorî ango bi (germahiya zêde, toz, heywanên taluke, nebatên jehrî) û tiştên wiha re rû bi rû dimînin.***

Aşkera ye ku tehlûkeya van karên wiha giran ji bo zarokan hê tehlûketir e. Zarokên ku di sektora çandiniyê de dixebitin hem garên giran dikin hem jî ne li gorî şert û mercên Saziya Xebatê ya Navneteweyî tê xebitandin. Rojane zêdeyî 12 seatan dixebitin ango hefteyê herî kêm 72 seatan dixebitin. Ev rewşa xirab ji bo zarokên keç ên xebatkar hê xirabtir e. Zarokên keç ku wekî karker dixebitin, rastî çewsandineke wiha jî tên ku piştî kar berpirsiya karên malê jî di stûyê wan de ye. Ew seatên xebatê zêde ya li derveyî îradeya van zarokan bi destê dê, bav an jî kesên ku navbênkariyê ji bo dîtina karan dikin, tê destnîşankirin û pêk tê.



*https://ekmekvegul.net/gundem/yoksullugun-ve-savasin-yuku-cocuk-iscilerin-omzunda*

***Mersin'in Tarsus ilçesine bağlı Yenice'ye çalışmaya gelen kız çocukları***

## 2- DÎ KARÊN ÇANDİNİYÊ DE SERERASTKİRİNÊN QANÛNÎ PÊK NAYÊN

Hin sererastkirinên qanûnî yên di bin navê pêşîgirtina li xebitandina zarokan hatine kirin. Ew sererastkirin wiha ne;

Madeya 71 ya bi hejmara 4857 (guhertin: 4/4/2015- 6645/ 38 md.) li gorî wê xebata zarokên di bin temenê 15 salî de qedexe dike. Lê zarokên ku 14 saliya xwe temam kirine û dibistana xwe ya seretayî qedandine, gihîştina wan a bedenî, zihnî, civakî û exlaqî û perwerdeya wan berdewam dike, bi rengekî ku nebe asteng ji dibistana wan re dikarin karên sivik bikin. Her wiha ji bo zarokên ku 14 saliya xwe temam nekirine bi rengekî ku nebe asteng ji bo dibistan û xwendina wan dikarin dikarên çandî, hunerî û karên reklamê de werin xebitandin bi rengekî ku peymaneke nivîskî bi wan re were çêkirin û bi şertê ku ji bo her xebatekê ji van xebatan destûreke cuda were xwestin.

Divê di xebitandina zarok û ciwanan de aliyên wan ên ewlekarî, tenduristî, bedenî, zihnî û derûnî û meyl û şiyanên wan ên kesane li ber çavan werin girtin. Divê karên dikin nebin asteng li pêşiya dibistana wan û zirarê nede şopandina wan a dersan a bi rêk û pêk.



*https://www.trthaber.com/foto-galeri/tarlalarda-buyuyen-cocuklar/29355/sayfa-1.html*

***Ankara'nın Polatlı ilçesinde soğan hasadında çalışan ve ailelerine yardım eden çocuklar (AA/ 6.10.2020)***

Karên karker dikarin bikin û şert û mercên xebatê ji aliyê Wezareta Ewlehiya Civakî û Xebatê ve bi rêziknameyê tê diyarkirin (1) (2):



- Karên qedexe yên ji bo karkerên ciwan û zarokên 18 salê xwe temam nekirine û karên destûr ji bo karkerên 15 salê xwe temam kirine lê karkerên ciwan ên 18 salê xwe temam nekirine
- Karên sivik ên zarokên 14 salê xwe temam kirine û dema xwe ya perwerdeya mecbûrî temem kirine
- Karên ji bo karkerên ciwan ên 16 salê xwe temam kirine lê 18 salê xwe temam nekirine.

(Guhertina: 4/4/2015- 6645/ 38 md.) Seatên xebitandina zarokên ku dibistana xwe ya seretayî ango xwendina xwe ya mecbûrî berdewam nakin rojê 7 û hefteyê 35 saet in. Di xebatên zarokan ên di çand, huner û reklamê de jî divê ne zêdeyî vê yekê be, di rojê de 5 seat û di hefteyê de 30 seatan dikare bixebite. Ev mawe ji bo zarokên ku 15 saliya xwe temam kirine dikare bibe rojê 8 seat û hefteyê 40 seat.

Ji bo zarokên beriya dibistanê û zarokên ku dibistana xwe berdewam dikin, li derveyî dema dibistanê herî zêde rojê 3 saet û di hefteyê de 10 seatan dikarin bixebitin. Dema ku dibistan girtî bin jî divê wekî ku di fikreya 4'an de li jorê hatiye destnîşankirin be û wan saetan derbas neke.

(Ek: 4/4/2015- 6645/ 38 md.) Ji bo destûra xebitandina zarokan di çarçoveya karên çand, huner û reklamê de der barê saetên xebatê û bêhnvadanê de, der barê pereyên ku dê bidin wan, şert û mercên xebitandina wan, divê fikir û raman û nêrîna saziyên wekî Wezareta Polîtîkayên Malbat û Civakî, Wezareta Çand û Tûrîzmê, Wezareta Tenduristiyê, Wezareta Perwerdeya Neteweyî û Desteya Bilind a Radyo û Televîzyonê, li ber çavan were girtin û li gorî wan rêbazan tevbigerin.

# 3- PÎRSGÎRÊKA PERWERDEYÊ

Di qanûna hejmar 4857'an de jî tê gotin û piraniya zarokên ku di zeviyên çandiniyê de dixebitin karên giran dikin û her wiha li gorî peymana ÎLOy'ê ku Tirkiyeyê jî îmze kiriye, temenê van zarokên ji 15 salî biçûktir in.

Li gorî rapora "Di Çandiniyê de Kedxwarina Keda Zarokan û Hesasiyeta Civakî" ya di sala 2012'an de hatibû amadekirin navîniya temenê zarokên ku di sektora çandiniyê de dixebitin wiha ne; temenê zarokên kur 9,2 û temenê zarokên keç jî 9,6 e. Pereyên ku zarok di zeviyan û çandiniyê de qezenc dikin wekî dahata hevpar a malê tê hesibandin û ev pere nemaze ji bo mesrefên zarokan nayê xerckirin. Piraniya van zarokan li gund û bajarên kurdan dijîn û xwendevan in.

Li gorî lêkolîna "Komeleya Piştgiriya Jiyanê" ya sala 2014'an ku komeleyê bi 168 malbatan û bi giştî 1.353 kesan re hevdîtin pêk anîbû û piraniya zarokên van malbatan li zevî û baxçeyan dixebitin. Ji %35'ê zarokên ku temenê wan navbera 5 salî û 11 salî ye di zeviyan de dixebitin û ev dane ji bo zarokên ku temenê wan navbera 12 û 15 ye derdikeve ji %78'an û ji bo zarokên ku temenê wan navbera 12 û 15 ye derdikeve ji %85'an. Piraniya zarokên malbatên karkerên demsalî ne ji perwerdeyê dimînin. Lêkolîna "Komeleya Piştgiriya Jiyanê" destnîşan dike ku piraniya zarokên ku di zeviyan de dixebitin an dev ji dibistanê berdidin û an jî naçin dibistanê û nakevin dersan. Ji %50'yê zarokên ku temenê wan 18 û di bin 18'an de ye dev ji dibistanê berdidin û ev dane ji bo zarokên di zeviyan de naxebitin jî %21 e. Ji %57'ê zarokên ku di zeviyan de dixebitin û di heman demê de xwendevan in bi awayekî rêk û pêk naçin dibistanê û ev dane ji bo zarokên naxebitin ji %43 ye.

http://www.ka.org.tr/dosyalar/file/Yayinlar/Raporlar/TURKCE/Virus%20mu%20yoksulluk%20mu.pdf



*httpwww.bizimsivas.com.trhaberders_zili_bu_kez_tarlada_caldi-26369.html*

***Zarokên ku ji bo piştgiriya malbatê neçar in di zeviyan de bixebitin û di dema nexweşiya Kovîd-19'ê de karkerên zarok ku hatine Sêwasê û dixebitin. Zarok di kon de perwerdeya xwe didomînin. (16.10.2020)***

# 3- PİRSGİRÊKA PERWERDEYÊ

Di pêvajoya nexweşiya Kovîd-19'ê de perwerdeya online dest pê kir û di dema perwerdeya online de rewşa xirab a zarokên karkerên demsalî bêtir derket holê. Piştî ku perwerdeya dîjîtal dest pê kir, zarok ji bo platforma perwerde EBA'yê sûd werbigirin divê televizyon, tablet/kompîtir û înterneta wan hebe. Ji ber ku pêwendiyên bingehîn ên zarokên karkerên demsalî nebûn zarok ji perwerdeyê bêpar man û ev zarok ji aliyê Wezareta Perwerdeya Neteweyî ve tune hatin hesibandin. Wezareta Perwerdeya Neteweyî berpirsyar e ku mafê perwerdeya hemû kesan bi cih bîne lê ji bo zarokên ku di konan de dimînin hewcedariyên ceryan, înternet û kompîtirê nehatine cih. Ji ber vê yekê zarokên ku parçeyek karê çandiniyê ne bi destê hikûmetê ji mafê perwerdeyê hatine dûrxistin. Di nav çînên civakê de komek ji perwerdeyê hatiye dûrxistin û îdiaya perwerdeya ji bo her kesî hatiye pûçkirin. Ger mirov bi awayekî din bîne ziman; ji bo zarokên karkerên demsalî û çandiniyê pêşerojek nehatiye amadekirin û zarok neçar hatine hiştin ku bibin karkerên çandiniyê.

Çend meh berê Wezîrê Perwerdeya Neteweyî Ziya Selçûk çûbû serdana zarokên karker ên demsalî. Di dema serdanê de wezîr twîteke wiha nivîsandibû; "Me pirtûkên betlaneya havînê, bi hinek firingiyan pevguherand. Ricayeke min ji mamoste û midûrên me heye; bila vê havînê rêya we bi zeviyan bikeve. Ji kerema xwe re pirtûkan bidin zarokan û bi wan re sohbet bikin."

Wezîrê Perwerdeya Neteweyî Ziya Selçûk li şûna ku li hemberî karkeriya zarokan derkeve û bibêje cihê we dibistan e, vê mijarê wek amûr bi kar tîne û twîtan dinivîsîne.

Lazim e hikûmeta AKP'ê bi feraseta dewleta sosyal ji bo mafê perwerde û tenduristiya zarokan seferber bibe lê zarokan wek karkerên erzan dibînin. Bi vê mînakê careke din derdikeve holê ku AKP wek hemû mijaran di vê mijarê de jî ji bo sermayedar bêtir qezenc bikin li zeviyan xebata zarokan rewa û normal dibîne.

Ziya Selçuk
@ziyaselcuk

Geçtiğimiz pazar günü mevsimlik işçilerin çocuklarıyla tarladaydım. Yaz tatili kitaplarını, bir salkım domatesle takas ettik. :)

Öğretmenlerimizden, müdürlerimizden bir ricam var: Yolunuzu tarlalara düşürün bu yaz. Çocuklara kitabını verin, sohbetinizi verin lütfen...



*Fotoğraf: twitter.com*

***Wezîrê Perwerdehiya Netewê Ziya Selçûk, li nava erd de bi zarokên karkeran re***

***Li aliyê din, Anketa Karkerên Zarok a TUÎK'ê ya sala 2019'an ya der barê hejmara karkerên zarok de hatiye amadekirin ne rast e. Dema mirov dema amadekarin û nirxandina daneyên heyî li ber çavan digire derdikeve holê ku rastiya karkerên zarok û rewşa zarokên neçarî xebatê tên hiştin ji raya giştî tê veşartin.***

***Anketa Karkerên Zarok a TUÎK'ê ya sala 2019'an di mehên cotmeh û kanûnê de hatiye amadekirin. Di mehên cotmeh û kanûnê de xebatên çandiniyê û zeviyan pir kêm dibin û ji ber ku serdema perwerdeyê dest pê dike û dibistan vedibin karkerên demsalî vedigerin bajarên xwe. Daneyên ku der barê karkerên çandiyê yên zarok de hatiye amadekirin ne rast in, ji ber ku piraniya zarokan demsalên biharê û havînan di zeviyan de dixebitin.***

# 4- PÎRSGÎRÊKA TENDURÎSTIYÊ

Li Destûra Biingehîn a Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê tenduristî wiha hatiye pênasekirin:

> **“ Tenduristî tenê nebûna nexweşî û astengdariyê nîn e; di warê bedenî, ruhî û civakî de rewşa başbûnê ye. ”**

Zarok di navbera 4 û 7 mehan de ji cihê ku lê dijîn dûr dikevin, li konan dijîn û ji ber vê yekê ji xizmetên tenduristiyê yên bingehîn bêpar dimînin. Zarokên ku karê çandiniyê dikin û di zeviyan de dixebitin ji ber şert û mercên nebitendurist nexweş dikevin. Her wiha cudakariya navbera zarokên keç û zarokên kur li holê ye. Li hemberî nexweşiyan ji %12'ê zarokên keç tê aşîkirin lê ji bo zarokên kurd ev rêje ji %52 ye. Her wiha xebata zêde, monotîzm, têr ranezan, ji perwerdeyê dûrketin û têra xwe nelîstin bandoreke neyînî li ser tenduristiya ruhî ya zarokan dike. Ji ber van sedeman zarok her tim westiyayî ne, bêeleqedar in, bêzar in, bêdeng in û xwe bêqîmet hîs dikin.

Ji bo zarokên ku di zeviyan de dixebitin şert û mercên xizmeta tenduristiya ruhî û piştgiriya psîkolojîk dûr in û zarok ji van xizmetan bêpar dimînin.

Di heman demê de bi awayekî rêk û pêk razan, têra xwe lîstin û bi zarokên temenên xwe re dem derbaskirin tê astengkirin. Ji bo zarokan di mijara ruhî û hestî de pêşketin wek pêwîstiyekê ye û di demên dawîn de hejmara zarokên ku van pêwîstiyên xwe bi dest naxin zêde dibin.

Zarokên karkerên demsalî di şert û mercên giran de dixebitin û gelek zarok bi qezayên trafîkê, di avê de xeniqîn, jehrîbûna li çandiniyê, qezayên kar re rûbirû dimînin.

Li gorî daneyên meclisa Tenduristiya Kar û Ewlehiya Kar (ÎSÎG) 8 mehên ewil ên sala 2020'an cinayetên kar herî zêde di karên çandinî, înşaet, bazirganî/buro, tenduristî, veguhastin, metal, şaredarî/karên giştî, tekstîlê de pêk hatin û herî kêm 1.306 karker mirin. Di meha tîrmehê de herî kêm 164 karker mirin. Ji 164 kesên jiyana xwe ji dest dan ji wan 7 kes zarok bûn û di karên çandinî û metalê de dixebitîn.




*httpsdokuz8haber.netemekdunyasikonyada-tarim-iscilerini-tasiyan-minibus-ve-tir-carpisti-6-kisi-oldu*

***Di 27'ê hezîrana 2020'an de li Yunaka Konyayê wesayîta karkerên demsalî qeza kir û di encama qezayê de 2 jê zarok bi giştî 7 karkerên demsalî mirin.***

# 5- POLÎTÎKAYA DEWLETÊ

Di esasê xwe de polîtîkaya ewlehiyê ya dewletê, bû sedema ku bi hezaran kedkarên çandiniyê dev ji qada xwe ya jiyanê berdin, berê xwe bidin erdnîgarî û çanda ku qet nizanin û bi her cureyên tundiyê re rûbirû dimînin.

Karkerên çandiniyê bi gelemperî li qadên ku ji gelên herêmê dûr in, tên bicihkirin. Di navbera gelê herêmê û karkerên demsalî de dîwarên nayên dîtin hatine lêkirin. Kirdeya ku dibe sedema lêkirina van dîwaran jî polîtîkayên pergalê ya yekperestî û cudakariyê ye. Encama van polîtîyan hemûyan jî çanda lîncкirinê ye ku van salên dawîn derketiye asteke bilind. Bi taybetî di salên dawîn de her kes bi hinceta 'hesta neteweyî', xwe wek otorîteya dewletî dibîne û êrîşkirina kesên ku di çavên xwe de wek sûcdar in, rewa dikin.


Karkerên ku gelemperiya wan karkerên kurd ên demsalî ne, dema ji bo xebatan diçin bajarên din li wir rastî propakasyonên cuda û êrîşên nijadperestiya gelên wir tên, ev jî her tim wek rastiyeke biêş a Tirkiyeyê derdikeve pêşberî me. Wekî her demê yên herî zêde van êrîşan bandorê li wan dikin zarok in.

Zarok hîn di destpêka jiyana xwe de xwe di nav vê çanda lîncкirin û cudakariyê de dibînin. Zarokên karker ên demsalî ku ji xizmetên tenduristî, perwerde û civakî bêpar dimînin, bi pirsgirêkên wekî mercên xebatan, kêmheq û bêpar mayîna xizmeta civakî, mezin dibin.



*mezopotamyajansi.com*

***16 karkerên findiqan ku ji navçeya Şemrexa Mêrdînê çûbûn Sakaryayê, 5'ê îlonê rastî êrîşên gundî û kardêr hatibûn. Karkerên findiqan piştî êrîşan ji neçarî vegeriyan bajarên xwe.***



***Binfotograf (Fotoaltı): Bariş Demîr ê yek ji kesên rastî êrîşan hatin, diyar kir ku beriya bûyerê di navbera wan û kardêr de tu pirsgirêk tune bûye, dema ketina baxçeyê ku lê dixebitîn bi gotina 'kûçik' heqeret li wan kiriye, li ser vê yekê ji baxçeyê derketine û di dema derketinê de jî bi gotina 'hûn vê derê bajarê xwe dihesibînin, ev der yê me ye' gef li wan xwarine û bi daran êrîşên wan kirine.***

***Di her berhema çandinyê de ku em dikirin û tînin ser sifreya xwe, keda zarokan heye ku di şert û mercên nebaş de dixebitin.***

# HDP DİBÊJE:

❋ Ji bo zarokên karkerên çandinî yên demsalî bikaribin perwerdeya xwe bidomînin divê navendên perwerdeyê yên gerok bên avakirin.

❋ Divê navenda perwerdeya pêşdibistanan li herêmên ku zarokên karker li wan hene bên zêdekirin û bi vî awayî wekheviya perwerdeyê pêk were. Di vê çarçoveyê de, ji bo perwerdeya ji dûr ve ji bo malbatên zarokên karker ceyran bêpere bê dayîn, înternet bê peydakirin û divê ji bo zarokên ku hatine temenê perwerdeyê tablet/kompîtir bên peydakirin.

❋ Ji bo telafîkirina perwerdeya zarokan divê bername bên amedekirin û bi lez û bez bikevin dewrê.

❋ Ji bo malbatan xizmeta şêwirmendiya perwerdeyê divê bên dayîn.

❋ Rewşa zarokên keç ku ji her derfetan tên mehrûmkirin, li ber çavan bê girtin û li gorî vê stratejiya hesas a zayendê bê pêşxistin.

❋ Li hemberî nexweşiyên perok di serî de zarok divê hemû kesên ku parçeyekê koçberiyê ne bên aşîkirin û bi awayekî rêkûpêk ji aliyê tenduristî ve bên kontrolkirin.

❋ Divê serarastkirina qanûnan ku rê li ber xebitandina zarokan a di karên giran de digire, bi lezgînî pêk were

❋ Divê tenduristiya ruhî ya zarokan li ber çavan bê girtin û bi vî awayî bi piştgiriya psîkologan û pisporên pêşveçûna zarokan xebat bên kirin.



HDP Genel Merkez
Adres: Barbaros Mah. Büklüm Cad. No: 117 06680 Çankaya/Ankara

@HDPgenelmerkezi
www.hdp.org.tr

HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ